# WINDABÛN

Emîne Elhac

Ez nizanim çi bipeyivim. Hemû peyv li ber çavên min dibine baroveyeka spî û bo layê te ve diçe. Ez nizanim, çi bipeyivim! Pêgav, pêgav di gel te ber bi dilîniyeka aşopî ve diçim. Hizrên min baroveyeka har e. Li ber dûkêla eşqa te dixeniqe û di serê min de kevalekê bi xwîn dinexşîne. Serokê pir bijare ku hizrûbîr li ber dengê dilê min dilehîzin. Di semayekê şêt de, rondik her di çavên xemgîn de dizîndan kirîne û hewareka xendiqandî hizrên min havil dikin, li cem xaniyên heriftî, barê xwe heldigirim bo wexereka dûr, di nav davên rojê, hizrûbîrhatin di gemya xemên min de di nav deryayeka pitirîn niqom dibe. Min, divê dilê xwe bi barana eşqa te av bidim, di gel rojê bihelim û berze bibim da çu pirsyar ji min neyêne kirin. Ditirsim bikevim, bibêjim bê te ez çu nînim. Belê, ya mayî bibêjim were careka dî da rojanên xwe xirve bikin. Toza hinde salan li ser, daqutin, da şev li me neborin bê peşîmanî geş bibin stêra min helgirim û şemalka jîna xwe bê evîna min di dilê min de bo te stêreka geş û paşeroja min di gel te ji ronahiya tavê geştir...